


Bîlal Guldem



SPAS JI BO ALÎKARÎYA WAN

Beroj Mukrîyanî
Bîlal Guldem
Dûrzan Cîrano
Enwer Ozkahraman
Ferhad Aslan
Jîyan Ozkan
Mazlûm Sîyabend
Mûrat Adiyaman
Orhan Tanhan
Selmet Guler
Tehsîn Baravî
Ugur Sermîyan


TÊKILÎ

folklorame@gmail.com
folklorame


Her nivîskar ji nivîsa xwe berpirsîyar e.


## Kovara folklorê ya sê mehane


**Sal:** 2
**Hejmar:** 5
**Xwedî:** Li ser navê Weqfa Mezopotamyayê, Selîm Olçer
**Berpirsa Nivîsan:** Gevrîye Atli
**Edîtor:** Eşref Keydanî
**Redaksîyon:** Evîndar Şevîn
**Desteya Weşanê:**
Celîlê Celîl
Bêrîvan Matyar
Elîf Gunduz
Mem Mukrîyanî
Zîya Mukrîyanî

**ISSN:** 2667-6443

**Grafîk:** Sevînç Adiyaman
**Wêneyê bergê pêş:** Beroj Mukrîyanî
**Wêneyê bergê paş:** Orhan Tanhan


**Navnîşan:** Weqfa Mezopotamyayê
Mezopotamya Eğitim Bilim Sanat Sağlık ve Kültür Vakfı İktisadi İşletmesi
Urfa Yolu Üzeri, Serhat Plaza A/blok
Kat: 11 No: 29 Kayapınar/Diyarbakır
**Sertifika No:** 42382

**Çapxane:** Alioğlu Matbaacılık Bas. Yay. ve Kağ. San. Tic. Ltd. Şti.
Orta Mah.Fatin Rüştü Sk. No: 1-3/A Bayrampaşa-İstanbul
Tel: 0212 612 95 59
**Sertifika No:** 16919




# Pirtûka pêşnîyazkirî

**Navê pirtûkê:** Hikyatêd Cimeata Kurda (6 cild)
**Nivîskar:** Hecîyê Cindî
**Weşanxane:** Rûpel





# Naverok


5 Ji edîtorî

6 Havênê penîrê koçerî û penîrê çalê, **Zeynep Yaş**

9 Lorîyên Qelqelîyê-2, **Mehmet Yildirimçakar**

13 Werzên salê, **Yûsif Hêşetî**

14 Nifirên Devera Meletîyê, **Mahîr Ugur**

16 Padîşah û wezîr, **Kurdjan Sorî**

28 Nanê binê agir, **Elîf Gunduz**

30 Mamikên Qerejdaxê-1, **Mehpûs Serhedî**

32 Hesenê Aşewan û riwî, **Hikmet Yildiz**

43 Xaçepirsa folklorê, **Oktay Altûn**

44 Kundirê dagirtî, **Zîya Mukrîyanî**

48 Kûskûs Xotûn, **Xidir Mûtlû**

50 Meseloka zilamê piştxûz, **Mûsa Tirk**

51 Hingvîn, **Sidîq Gorîcan**

52 Hevalên Erxenîyê, **Eşref Keydanî**

56 Nav û taybetîyên hin cureyên gîyayî li Mêrdînê-3, **Mem Mukrîyanî**

60 Biwêjên gundê Çîçikayê-1, **Bêrîvan Matyar**

62 Gîtê zimistanî, **Surya Human**

66 Motîfên Çîroka Hebhenarkê, **Haşîm Esen**

72 Koyê Bîngolî, **Aydin Batur**

78 Li Serhedê xwedîkirina gamêşan û şerê gamêşan, **Yaşar Eroglû**

82 Mirîşk di zargotinê da, **Bahoz Baran**

88 Pêkenokên Helexîyan, **Elîf Gun**

92 Sêwaz, di Seyahetnameya Ewlîya Çelebîyî da, **Ozcan Çîçek**

100 Hero herrin, **Zerrweş Xodî**

108 Danasîn û nirxandina Gulançkzêrînê, **Evîndar Şevîn**

# Ji edîtorî

Kal û pîrên me dibêjin, “Bihara rengîn, gul û gupikan da bîn.” Hejmara pêncem ya Folklora Me wekî gul û gupikên biharê vebû û bi bêhna xwe ya xweş li benda we xwînerên ezîz û dilovan e. De kerem bikin, em li ser sifreya me ya biharîn rûnin û folklora xwe bitehmijînin.

Rojên biharê, mohra xwe li dîrok û çanda me daye. 12ê Adarê û 16ê Adarê. Du birînên ku hîn jî şûna wan baş nebûye. Du birînên ku dikelin. Qamişloka evînê û Helebçeya şehîd, du bajarên birîndar, ji bo kurdan evîndar.

Bihar bereket, hêvî û nûroj e; vîn û evîn, kesk û şîn, dilvîn û xemrevîn e. Bihar geh dilê mirovî dikelîne geh jî mirovî mîna perperîkan li dora kulîlkan digerîne. Bihar her tiştî dihemilîne û hemû tiştan dikemilîne. Bihar di dilê mirovî da dibe a(gi)r. Dil û agir dibin dilagir. Dilagirên dilawer, Agirê Newrozê geş dikin li sikak û kolanan, li çol û çîyayan, li newal û gelîyan, li deşt û zozanan; li Îdîr, Dêrsim, Sêwaz û Wanê, li Akrê, Dihok, Şingal û Çomanê, li Îlam, Bane, Bokan û Serdeştê, li Amûd, Raco, Şîyê û Dêrikê. Agir û Newroz du motîfên giring yên folklora kurdan in. Cejna Newrozê, cejna neteweyî û cejna hebûnê ye. Newroza we pîroz be.

Bihar kewna folklorê ye. Biharê bêrîvan û şivan bi heyranokan birînên dilên xwe dikewînin, pîrejin dewî dikeyînin, keçên xama li pincarê xortan dibînin û ji nava dilan dilekî dihebînin. Zarok li devê çem û kanîyan, li qerac û zevîyan; kereng, tûzik û tolikê berhev dikin û vê gotinê ji devê hev direvînin; “Tûzikê dixwim tol dibim, serxanîyan hol dibim.”

Mirîşka qupketî, motika şikestî, gîyayên biharê, kundirê dagirtî, nanê binê agir, havênê penîrî, zilamê piştxûz, gamêşên Serhedê, Çîyayên Bîngolê, mamikên Qerejdaxê; hin ji wan mijar û motîfên me yên vê hejmarê ne. Xwe biavêjin gundê Çîçikayê, berê xwe bidin Serhedê, we bivê biçin aşê Hesenê Aşewanî û bibin mêvanê rovîyî, we bivê berê xwe bidin Midyadê û herin bikevin nava cimeata Helexîyan. Ku we nevê, herin Sêwazê yan jî mîna keçika ku li birayên xwe digere, li kereka xwelîyê siwar bibin û berê xwe bidin çol û çîyayan. Nebe nebe hûn silavekê bidine pîrehûtê yan jî amojina Hebhenarkê. Kî hat ber derîyê we jê bawer nekin û mîna keça zana ya ku padîşah ji aqilê wê ma heyirî, jêhatî bin; da ku paşa û wezîr bibin xulam û xizmetkarên we.

Hêvîya me ew e ku nîsan bi baran be, gulan jî bêtofan û bi ba be. Ku bû hezîran, em ê bi hejmara şeşem bên mala we, rûnin li cem haziran.



**Eşref Keydanî**